



Bê dirav e

MIZGÎN

Hejmara 178

15- SIBAT 2025



Naverok

Wênesazî

Wêjeya Zarokan

Lîsk

Welatê me

Tu dizanî

Tendirustî

Tîp û gotin

Navdar

Bexçeyê Navan

Jîngeh mala me ye

Jêhatiyên Zarokan

çîrok

Bixwînin û fêr bibin

Wêne û tablo

**Amadekirina Naverokê
Amir Ferso**

**Şêwekar
Umer Ishaq
Xalid Bîco
Cihan Isma'îl
Baran zagros**

**Sererastkirina Erebi
Abdulah Rehîl**

**Sererastkirina Kurdî
Mihemed Xanim**

**Wergera Sûryanî
Calînos Yûsif
îsa**

**Dîzayn
Mecid Alsadûn**

**Her 15 rojan carekê Kovara Mizgîn ya zarokan ji
hêla saziya Ronahî ve tê derxistin**

Wêneyê kêka mîna
wêneyê di tabloyê de
xuya dike, rengîn bike.

أَكْمِلْ تَلْوِينَ صُورَةَ قَالِبِ
الْكَاتِبِ كَمَا فِي اللَّوْحَةِ.



Cerê Avê

Rojekê ji rojan pîrejinekê avê bi du ceran tîne mala xwe. Herdû cereyan bi darekî ve li ser milê xwe dike. Ji wan herdû cereyan yek jê bi kun e û yê din saxlem e. Her caran bi cerek û nîvekî dihat mala xwe û demek li ser vê rewşê ma.

Cerê bi kun li qiraxa rê diherike ta ku dighêje malê tenê nêvî dimîne û ji xwe yê saxlem bi karê xwe kêfxweş e ku ava xwe tevî dighîne malê, lê kwîzê din ji xwe şerim dikir ku nikare weke yê din be.

Piştî êşkişandina demekê bi pîrejinê re diaxive:

Ez ji xwe şerim dikim, ez avê tam baş nagihînim malê!

Pîrejinê lê vegerand û got:

Ji ber xwe şerim meke li rex rê biner bê çiqas gul û çîçek li aliyê te şîn hatine. Min dizanî av ji te diherike lê belê min tov li rex rê çandin û bi ava te ev gul û çîçek rê û mal tev şîn û xemilandî bûne. Eger ne ji wê kunê ba ev gul û çîçek şîn nedihatîn.

**Xorşîd
Xalid**



Bi xêzekê lawiran û
xwarina wan ya jê hes
dikin, bigihîne hev.

صِلْ كُلَّ حَيَوَانٍ بِمَا
يُنَاسِبُهُ مِنْ طَعَامٍ



Çiyayên Nemrûd ên şûnwariyê

Hevalino! Gelo hûn dizanin ku hin çiyayên kevnar xwedî çîrokên balkêş hene? Belê, ew jî çiyayên Nemrûd ên şûnwariyê ne, ew yek ji deverên xweşik in. Herwiha girîngtirîn deverên dîrokî ne ku hûn dikarin çîroka wan nas bikin.

Çiyayên Nemrûd li Bakurê Kurdistanê nêzî çemê Firatê ye. Dîroka avabûna vê deverê jî vedigere nêzî 2 hezar sal!

Ev çiya bi peykerên xwe yên mezin ku nûnertiya şah, xwedawendên dîrokî û bazan dike, gelekî navdar in. Çiyayên Nemrûd roleke girîng di warê parastina dîrokê de dilîze. Ev peyker jî çîrokên serdemên dîrokî, jiyana şah û gelên kevnar ji me re vedibêje.

جبالُ نمرودِ الأثرية

يا أصدقاء! هل تعرفون أن هناك جبالاً قديمة مليئةً بالحكايات المثيرة؟ إنها جبالُ نمرودِ الأثرية، واحدة من أجمل، وأهم الأماكن التاريخية، التي يمكنكم سماعَ قصصِ عنها!

تقعُ جبالُ نمرودِ في باكورِ كُردستانِ، بالقربِ من نهرِ الفراتِ، يرجعُ بناءُ هذا الموقعِ لما يقربُ من 2000 سنة! وهي مشهورةٌ بالتماثيلِ الجملاقة، التي تمثلُ الملوكِ والآلهةَ القديمةَ والصقورَ. وهي ذاتُ أهميةٍ في الحفاظِ على التاريخِ، وأن التماثيلِ القديمة؛ تُخبرنا قصصاً عن الماضي البعيد، وعن حياةِ الملوكِ، والشعوبِ القديمة.



Hevalên hêja! Gelo hûn dizanin ku biskilêt yek ji amûrên çêker ên dihêle ku em bi awayekî xurtir tevbigerin û bi hewawya paqij dilxweş bibin? Weke tê zanîn jî ev amûr berî 200 salan hatiye çêkirin!

يا أصدقاء! هل تعلمون أنّ الدراجة الهوائية، هي واحدة من الاختراعات، التي جعلنا نتحرك بسرعة، ونستمتع بالهواء النقي؟ فأول دراجة في العالم، صُنعت قبل أكثر من 200 سنة!



Biskilêt amûreke biçûk ji bo çûnûhatinê ye, du tekerê wê hene, bi riya lingên mirov di çarçoveyê xelekî de tê zivirandin. Lewma jî gewde û zendên mirov bi hêz dike. Herwiha gera xwîna laşê me xurtir dike. Di heman demê de jîngê jî diparêze û hewayê qirêj nake, sedem jî ew e ku pêwîstiya biskilêtan bi sotemeniyê tune ye. Hêjayî bibîrxistinê ye jî ku hin biskilêt bi sê dolaban hene. Ev cure bi taybet ji bo zarokan tê bikaranîn da ku zarok bi awayekî bi ewle û dilaram bijan.

وهي وسيلة نقل صغيرة، لها عجلتان، وتعمل بحركات الرجلين على قرص دائري، وبذلك تقوي الجسم فتزيد عضلاته قوة، وتجعل دورتنا الدموية قوية، وصحية، وإنها تحافظ على البيئة؛ لأنها لا تحتاج إلى وقود، فهي لا تلوث الهواء، وهناك دراجات بثلاث عجلات للأطفال الصغار لمزيد من الأمان، ومتعة الركوب.



Vexwarina avê ji bo tenduristiya me tiştêkî gelekî sûdmend e, werin hevalino em bi hev re van sûdan nas bikin. Ji bo ku em xwedî tenduristiyeke baş bin divê em avê vexwin.

- Her tim bila şûşeyeke avê li cem te hebe.
- Berî her xwarinekê qedehek av vexwe.
- Da ku tama avê xweştir bibe, hin parçeyên leymûn an jî perteqalan tevî ava xwe bike.
- Şînahî jî ji bo ku mîna me bijîn, hewcedariya wan bi avê heye.

إِنَّ شُرْبَ الْمَاءِ مَفِيدٌ لِّصِحَّتِنَا فَلْنَعْتَدْ بِشُرْبِهِ يَوْمِيًّا، تَعَالَوْا، أَصْدِقَائِي؛ نَتَعَرَّفْ مَعًا عَلَى فَوَائِدِ الْمَاءِ، نَحْتَاجُ إِلَى شُرْبِ الْمَاءِ لِتَبْقَى أَجْسَادُنَا بِصِحَّةٍ جَيِّدَةٍ.

- اِحْمَلْ زِجَاجَةَ مَاءٍ مَعَكَ دَائِمًا.
- اشْرَبْ كُوبًا مِنَ الْمَاءِ قَبْلَ كُلِّ وَجْبَةٍ طَعَامٍ.
- أَضِفْ شِرَائِحَ اللَّيْمُونِ، أَوْ الْبَرْتَقَالِ إِلَى الْمَاءِ، لِیَصْبِحَ طَعْمُهُ لَذِيذًا.
- النَّبَاتُ أَيْضًا مِثْلُنَا یَحْتَاجُ إِلَى الْمَاءِ؛ كَمَا یَنْمُو.

Hevalên hêja, tîpên kêma temam bikin; ji bo ku hûn navan li gorî wêneyên wan temam bikin.



G

u

l


b

e

r

o

j





Mîna Qadî

مينا قاضي

Mîna Qadî jineke dilwêrek û zîrek bû, li Kurdistanê jiyaye, ew hevjinê Qadî Mihemed bû ye ku Komara Mihabad di sala 1946'an de li Îranê damezirand. Mîna Qadî bi piştgiriya hevjinê xwe di warê rêvebirina gelê kurd ber bi azadiyê ve navdar bû.

Mîna Qadî zanîn û rewşenbîrî belav dikir, pê re jî destek dida jinên kurd. Ew di pêşveçûna Komara Mihabadê de xwedî roleke girîng bû, bi riya wê civak bû xwedî zanist û hîmê civakê bi ruhekî hevpar da avakirin. Hêjayî gotinê ye ku wê Yekîtiya Jinên Demokrat di sala 1945'an de li Rojhilatê Kurdistanê damezirand û bû seroka wê. Mîna Qadî bû sembolek ji bo jina kurd, ji ber ku ew di astengiyan de bi dilwêrekî û sebra xwe nimûneyî bû.

مينا قاضي كانت امرأة ذكية وشجاعة، عاشت في كردستان وكانت زوجة القاضي محمد، الذي أسس جمهورية مهآباد عام 1946 في إيران. عرفت بدعمها الكبير، لزوجها في قيادة الشعب الكردي نحو الحرية. كان للسيدة مينا قاضي دور مهم في جمهورية مهآباد؛ فقد كانت تنشر الوعي، وتشجع النساء الكرديات على التعلم والمشاركة في بناء المجتمع، فأسست مينا خانم "الاتحاد النسائي الديمقراطي" عام 1945 في شرق كردستان، وترأسته. وقد أصبحت رمزاً للمرأة الكردية لأنها كانت مثلاً للشجاعة والصبر في أصعب الأوقات.

Hin Navên
bi tîpa - **F**

Felat

Ferhad

Felek

Fermandar

Firat

Fîdan

Firaz

Feraşîn

Bexçeyê Perperokan
Hevalên hêja hûn çiqasî ji
perperokên xweşik ên
rengreng hes dikin? Ka werin
ez we hîn bikim ku çawa
bexçeyekî ji bo perperokan di
mala xwe de an jî li ser balkonê
çêbikin!

Perperok zindiyên nazik in û
gelekî ji kulîlkan hes dikin. Ew
şîrava kulîlkan dimijin, lewma jî
tiştê herî xweş li cem wan
kulîlkên rengxweşik û
bênxweş in. Ji ber vê yekê divê
em kulîlkên quriful û lafinderê
biçînin. Da ku em bala
perperokan bikişînin, de werin
em baxçe bi kulîlkên sor, zer û
şîrikî bixemilînin. Divê em ji bîr
nekin ku tasek av deynin
derdorê ji bo perperok jê
vexwin. Bi vî awayî jî
baxçeyê we rengîn û zindî
dimîne.

حديقة الفراشات
يا أصدقاء! هل تحبون الفراشات
الجميلة بألوانها الزاهية؟ دعوني
أخبركم؛ كيف يمكنكم إنشاء حديقة
الفراشات الصديقة في منزلكم، أو على
شرفيتكم!
الفراشات كائنات لطيفة، تحب الزهور
كثيراً؛ لأنها تمتص رحيق الأزهار،
وتفضل الزهور، التي تتميز بألوان
زاهية، ورائحة طيبة. لهذا يجب أن
نزرع أزهار القرتفل، واللافندر، لنجمل
الحديقة بالزهور البنفسجية والحمراء
والصفراء، وتجذب الفراشات، وعلينا
ألا ننسى أن نضع طبقاً صغيراً من الماء،
لتشرب منه الفراشات، وهكذا تكون
حديقتكم مليئة بالألوان والحياة!



Di demsala zivistanî de hûn ji kîjan cureyên fêkiyan hes dikin?

ما الفاكهة، التي تفضلها في فصل الشتاء؟



Xedîca Ibrahîm Imêrat: Ez ji sêvan hes dikim, ji ber ku gelekî bi sûd û tendurist in.

خديجة إبراهيم عميرات: التُّفَّاح؛ لأنَّه مفيدٌ وصحِّيٌّ.



Ronî Xesan Mardînî: Ji perteqalan hes dikim, ji ber ku ez ji bişava wan hes dikim.


روني غسان مارديني: البرتقال؛ لأنِّي أحبُّ عصيرَه كثيرًا.



Yûsif Hesên Hilal: Ez jî ji mozan hes dikim, ji ber ku gelekî xweş in.

يوسف حسن هلال: المَوْز؛ لأنَّه لذيذٌ وحُلُوٌّ.











Mayîn ya ê
aqlmendtîre.



Nermayî û
bawerî mifteya
mayînê ye.

Ax hevalê min,
pozbilindî her gav
dibe sedema
hilweşandinê.



Ez ê hertim bi te re bim hevalê min. Xem
neke wê dîsa qurmê te şîn bibe û tê kesk
bibe; ka em bi hev re dubare bikin ku
aqilmendî ji hêzê girîngtir e.






Şîr
كَلَيْبُ
Milk



Penêr
بَبَبُ
Cheese



Mast
لَبَبُ
Yogurt



Nîvişk
زُبْدَه
Butter

Çavê Mizgîn

Wêne û tablo لقطة العدد



مجاناً

مزكيز

العدد

178

15 - شباط

2025

